# Peyamê Serok Bush  ji bo Mûsulmanan

## bi helkeftina meha Remezanê...................

Bi helkefta hatina meha Remezana pîroz Ez silavêt xwe ji bo mûsilmanan di hinêrim, li nav Welatên Yekgirtîyên Amêrika û li seranserî cîhanê.

Remezan pîroztirîn mehe di ola Îslamê de, bîrhatina roja hatina  Qûraanê ye ji bo Mûhemed. Ev  meh delîveyê didete mûsulmanan da hizra ola xwe bikin u fermanên Xwdê bi cih bînin. Bi rojîya, bi nivêja, bi nêrînên kûr, bi xêr û çakîyan, mûsulman li seranserî cihanê sozên xwe bi cih di înin ji bo jiyaneka paqij, bi keramet u dilovanî.

Bi dirêjiya dîroka me , xelk ji bawerên cûda cûda taybetmendîya gelê me avakirîye. Îslam ola aştiyê ye , û xelkê bawerî bi Îslamê hey, pişikdaryeka mezin di avakirna welatê me û cîhanê de kirîye. Wek Amîrîkî , em behayê azadîya xwe ya olî di nirxînin, û em her pêgirtinê bi bawerya xwe dikin kû her kesek ji her  baweryeka olî ya taybet li welatê me behayê xwe heye. Bi hevra karkirin ji bo pêşvebirina azadîyê û lêk têgehiştinê , emê paşerojeka rohintir ya hêvî û delîveyan peyda bikîn.

Laura jî di gel min pîrozbahîyên xwe di hinêre. Remezan Mubarak...